Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1306 10-Îlon-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Qamişlo dergûşa şaristanî û pêkhateyan e



**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Bajarê Qamişlo di 20'ê Tebaxa 1926'an de li ser destê endizyarekî Ferensî hate avakirin. Li Qamişlo gelek pêkhate hene, mîna Kurd, Ereb, Suryan, Ermen, Aşûr, Kildan, Çerkez û hwd... Niha zêdeyî 432 hezar mirov lê dijîn û piraniya niştecihên wê Kurd in, herwiha bajarê Qamişlo weke paytexta Rojavayê Kurdistanê tê naskirin.**

Bajarê Qamişlo bajarekî Rojavayê Kurdistanê ye, weke paytexta Rojavayê Kurdistanê tê naskiriin. Ev bajar aramgeha Cegerxwîn,cihê û warê Kerebêtê Xaco, Mihmed Şêxo û Aramê Dîkran e. Bajarê Qamişlo hembêza xwe ji hezaran pakrewanên tevgera azadiyê re kiriye war. Lewma di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de jî, bejna xwe bi xwîna sedê pakrewanan xemilandiye.

### Avabûn û erdînîgariya Qamişlo

Bajarê Qamişlo bajarekî nû ye ku li ser zemîneke dîrokî ye, berî sînordanîna navbera Sûriyê û Tirkiyê de, ew deşta bajarê Nisêbînê yê Bakurê Kurdistanê bû. Bajarê Qamişlo di 20 Tebaxa sala 1926'an li ser destê endazyarekî feransî hate avakirin. Bajarê Qamişlo bi cihê xwe yê erdinîgarî xwedî girîngiyeke taybet e.

Li rojhilatê Qamişlo bajarê Amûdê 20 km, Derbêsiyê 60 û Serêkaniyê 102 km.

Li rojavayê Qamişlo Tirbispiyê 30 km, Girkê Legê 60 km û Dêrikê 100 km.

### Pêkhatiyên Qamişlo

Qamişlo bi navê Qamişloka evînê navdar e, di heman demê de gelek pêkhate lê dijîn mîna pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryanî, Ermenî, Aşûrî, Kildan, Çirkez û hwd… . Niha li bajarê Qamişlo zêdeyî 432 hezar mirov dijîn û piraniya niştecihê wê Kurd in.

### Komîn, tax, bajarok û gundên Qamişlo

Bajarê Qamişlo ji heft taxan pêk tê û di nava xwe de 85 komînan dihwîne, taxên wê jî ev in: Taxa Hilêliyê, Kornîş, Xerbî, Enteriyê, Cûdî, Qidûrbeg, Aşûriyê û Bişêriyê. Herwiha du bajarok bi bajarê Qamişlo ve girêdayîne ew jî bajerokê Tenûrî û Girbawî ye. Ev her du bajerok jî gelek gundan bi xwe ve girêdidin.

Bajerokê Tenûrî: Tê de pêkhateyên Kurd û Ereb dijîn û 21 girêdayî wê ne. Di heman demê de 34 gund girêdayî wê ne û navê wan gundan wiha ne: Tenûriya Nû, Tenûriya Kevin, Dekşûriya, Girkê Zêra, Qere Hesena Xerîb, Şewitî, Tilzîwan, Şorik, Omerk, Hamoya Mezin, Hamoya Biçûk, Ewêna Bakur, Ewêna Başûr, Til Eîd, Rîhaniya Mezin, Bolaziya, Çewlika Til Eîd, Xirbet Elsed, Xirbet Seîd, Xezina Nû, Hilwa Ebû Qsebîn, Hêlî, Hecîya Biçûk, Eskendiron, Rekabîya, Til Birîş, Elselam Elêk, Beçarîya, Xizna, Xizna Xir Mer, Bûyer Bûhasî, Xerb Esker û Cinêdiya.

Bajarokê Girbawî erdîgariya wê mezin e û 92 gund girêdayî wê ne, komînên wê jî 63'ê ne û meclisên wan jî girêdayî bajarê Qamişlo ne.

Di gundê girêdayî bajarokê Girbawî de pêkhateyên kurd û ereb dijîn û navê gundên girêdayî wê wiha ne: Til Oda, Merza, Em Cîvar Ezo, Em Cîvar Hemed, Cedîda, Xerbt Cedoh, Melûk Sirayî, Elî Fero, Nêf, Kotiya, Gêta Mezin, Gêta Biçûk, Ebû Diwêla Mezin, Ebû Diwêla Biçûk, Kirosala Bakur, Kirosala Bakur, Şidî, Demxya, Safiya, Elhamriya, Wetwetîya, Mezreha Elresaq, Heyî Newroz, Girbawî, Kevrê Spî, Keçil Ereb, Sahrmeka, Melasibat, Mişêrfa Biçûk, Elkerama, Setih Şerqî, Elreşîdiya, Girdêwan, Kêstek, Qoşan, Tomiya, Tomiya Foqaniya, Setih Xerbî, Tid Elşemaliya, Tifahiya, Cilbirat Kebîra, Bawih Kebîra, Bawih, Xerb Hesen, Til Elzeheb, Şebal Til Elzeheb, Elhizba Kîta, Hekolê, Til Teyîr, Medîna Reşo, Birko, Birko Leyalîya, Hirm Eerb, Xirbê Hesen, Til Elsûm, Delîl Herb Eldewasiya, Debaniya Qisim Elhîdan, Ebû Celal, Cemho, Ebû dewîl, Til Meha, Kerkota Cerna, Elinz, Xirba Ewratî, Til Kîf, Elrecim, Hemar, Eldalawiye ya Biçûk û Mezin, Elkîta, Hedîdka, Siker Şamisiya, Hey Newroz, Xirbet Zahir, Miryoza, Elrûfa, Firîwan, Ebû Diwêl 1, Cilbarta Mezin, Eltifahiyê, Ebû Diwêl 2, Qitbit Zekî, Delalî, Qîzî, Kilawê, Mişêrfa mezin û Dibanê.

Cihên dîrokî yên nêzî bajarê Qamişlo ev in: Çaxirbazar, Girê Leylên, Girê Mozan, Til Birak û Orkêş.

# Şikeftên Xwê bi efsûniya xwe mêvanên xwe pêşwazî dike

**Navenda Nûçeyan**


**Şikeftên Xwê yên li navçeya Qulpê ya Îdirê her roj bi sedan û hezaran mêvanan pêşwazî dike. Ev şikeft hem cihekî efsûnî û ezamet e hem jî navenda terapiyê ye.**



Şikeftên Xwê yên li navçeya Qulpê ya Îdirê di hundirê Çiyayê Xwê de ye. Şikeft li kêleka navenda navçeyê ne. Şikeft di demsala havînê de mêvanên xwe ango seredanên xwe pêşwazî dikin. Dema mirov di derî ango tunela şikeftan de dikevin hundir texmîn nakin ku hundirê şikeftan ewqas mezin e. Piştî mirov dikevin hundirê şikeftan heybetî û matmayîbûna şikeftan dibînin. Li ber deriyê şikeftan hewayek hênik wek hewaya zivistanê xwe li rûyê mirovan dide. Dema mirov diçe hundirê şikeftan, hin bêtir hênik e û cihekî efsûnî ye. Şikeftên Xwê wek navenda terapiyê jî tê zanîn.

Hundirê şikeftan hatine ronîkirin û şikeft bi awayên xwezayî û hewaya xwe ya hênik xwe radixe ber çavan. Di şikeftan de kulek-pace hene û herwiha li şikeftekê cihê bêhnvedanê û rûniştinê hatiye çêkirin. Kesên tên serdana şikeftan wêneyên xwe digirin û li bedewî û ezameta şikeftan temaşe dikin. Li aliyekî bênavber mirov tên serdana şikeftan û gelek kes jî ji bo şîfayê serdanê dikin. Ji ber ku ev der wek cihê terapiyê tê dîtin. Bêhna xwê ji şikeftan tê û şikeft wek şûnwarên dîrokî jî tên zanîn. Di mehên havînê de her roj bi hezaran kes serdana şikeftan dikin. Her wiha tê gotin ku şikeft ji bo nexweşiyên nefes û hilmkişînê û gelek nexweşiyên din jî dibe şîfa.

**Bi kamîreya Ayşa Silêman**



## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER KETINA JI QURETÎ, MEZINAYÎ Û HÊZÊ**

**Burxên wî sist bûne:**
- Ji quretiya xwe daketiye.

**Çeng û perên wî şkestin:**
- Hêviyên wî neman; ji hêzê ket.

**Darê xwe danî:**
- Ji xurtbûna xwe daket; hêza wî nemaye.

**Ew nema bi doxika gepcî digere:**
- Ew mir nema radibe.

**Min baskên wî birîn:**
- Êdî nikare zordestiyê bike.

**Per û baskên wî şkestin:**
- Hêviyên wî neman; ji hêzê ket.

**Roja wî ava bû:**
- Dema wî borî; navûdengê wî yê berê çû; bandora wî ya berê çû.

**Roja wî çû ava:**
- Bi heman wateyê.

**Şêr pîr dibe dibe qeşmerê rûviyan:**
- Dema yên xurt dikevin dibin pêkenok.

**Weke kerê guhsist lê hatiye:**
- Ji hêzê ketiye; êdî nikare xwe bilivîne.

**Zewrên wî sist bûne:**
- Ji quretiya xwe daketiye.

**LI SER TEVLÎNEBÛNA MIJARÊ**

**Bûk bi dilê zavê ye:**
- Em tevlî karê te nebin; tu dizanî; karê te ye.
(Dema yek dixwaze tiştekî ji xwe re bistîne jê re hingê dibêjin)

**Didanên min jê nasîqin:**
- Serê min bi vê mijarê naêşe; ev mijar ji min re ne xem e.

**Gur ku min nexwe bila gur be:**
- Kesê ziyana wî negihe min serê min pê naêşe.

**Kumê xwe kişand serê xwe:**
- Xwe bêdeng kir; tevlî nebû.

**Mûyek ji xwe nelivand:**
- Bandor lê nekir; ne li xema wî bû; pê eleqedar nebû; çawa ku nebihîstibe; çawa ku ne jê re hatibe gotin; li eynê xwe derneanî.

**Pembû xist guhê xwe:**
- Xwe nebihîstî kir; xwe kerr kir; çawa ku nebihîstibe; guh nedayê.

**Reşê xwe kişand serê xwe:**
- Xwe bêdeng kir; tevlî nebû.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Projeyên Îsraîl û Tirkiyê li Sûriyê'



Lêkolînerê li Navenda Firat a Lêkolînan Lezgîn Ibrahîm diyar kir ku projeyên Tirkiyê û Îsraîlê ji bo Sûriyê û giştî herêmê hene, projeya Tirkiyê ya dagirkeriyeke berfireh ku dixwaze dîsa Osmaniya nû vegerîne...**R-3**

## Bi banga aştiyê re dewleta Tirk pîvan û rêgezan bin pê dike



Dewleta Tirk a dagirker ji bo ku pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk berovajî bike bi hemû hêza xwe ketiye liv û tevgerê, li ser esasê konsepta qirkirinê li ser Kurdan her cûre êrîşan pêk tîne...**R-5**

## Dayîka Xedîce di şan û şînan de; awazvan, helbestvan û berxwedêreke



Dayîkên ku nirxên Kurdewariyê di rû û kêliyên jiyana xwe de parastine, bi sekna xwe a heyî bûne cîhanek bêdeng a ku divê em wê jiyanê ronî bikine. Dayîka Xedîce Dawud a 76 salî ku bi cavên xwe yên kur tu carî ronahiya cîhanê nedîtiye dibêje, "Min ronahiya jiyanê nedît, lê min jiyanek di dil û mejiyê xwe de ava kir".**R-2**

## Koma Arî bi govendên gelerî şahiyan xweştir dike



Ji ber ku ne her kes beşdarî mîhrîcan û festîvalên hunerî dibin, ciwanê Kurd yê bi navê Rawan Temo, bi armanca zindîkirina çanda Kurdî komeke govendê ji bo şahî û çalakiyan ava kir.**R-7**



**Gefên li ser Rojava**
Farûk Sakik R-5

**Ji Peymana 10'ê Adarê şerek derxistin**
Zekî Bedran R-5

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1306 10-Îlon-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# HIKUMETA VEGUHÊZ DEWAMA HIŞMENDIYA BAAS E

Piştî têkçûna rêjîma Bass li Sûriyê, hikumeta veguhêz a Sûriyê di nava 8 mehan de gelek komkujî li dijî gelên Sûriyê pêk anîn. Di encamê de heta niha zêdeyî 7 hezar û 500 kesên sivîl hatine kuştin. Hikumeta veguhêz bi kiryarên xwe dewama rêjîma Baas a têkçûyî ye û hişmendiya wê pêk tîne.**R-4**



## Li bajarê Dêrikê 41 gundên Beravê hene

Li herêma Dêrikê 41 gundên Beravê hene û her gundek xwedî taybetmendiyeke cûda û bi nirx e. Ji wan 3 gund vala ne, tu kes di wan de jiyan nake, 32 gund niştecihên wan Kurd in, 4 gund niştecihên wan Xiristyan in û 3 gund jî niştecihên wan Ereb in.**R-6**



# Dayîka Xedîce di şan û şînan de; awazvan, helbestvan û berxwedêreke

Dayîkên ku nirxên Kurdewariyê di rû û kêliyên jiyana xwe de parastine, bi sekna xwe a heyî bûne cîhanek bêdeng a ku divê em wê jiyanê ronî bikine. Dayîka Xedîce Dawud a 76 salî ku bi cavên xwe yên kur tu carî ronahiya cîhanê nedîtiye dibêje, “Min ronahiya jiyanê nedît, lê min jiyanek di dil û mejiyê xwe de ava kir".

Esma Mistefa/Qamişlo

Çîrokên bêdeng yên ku di bin bayê jibîrkirinê de mane, gelek in. Em her kes xwediyê çîroka jiyana xwe ne, xêzkirina wê li ser te dimîne, tu xwediyê biryara ku tu wê çîrokê bike şopek di dîrokê de ku neyê ji bîrkirin yan jî weke ku tu nîn bû, bi bayê demê re tune bibe ye.
Jinên ku di jiyana xwe di efsane nivîsandine û bûne xêzek ji dîrokê, gelek in. Di vejînkirina çîrokên jinên xwediyê serpêhatiyên bi nirx de, li pêşiya me bi hezaran efsane û çîrok derdikevin ji wan yên ku bi demê re hatine hîştin û yên ku heyanî niha ji me re bûne pêşeng hene. Ji van çîrok û efsaneyên dîrokî jî jina Kurd e. Jinên Kurd di pêşengtiya jiyan û şer de yên ku dîrok bi xwîna xwe nivîsandine hene. Lê di serdem û roja îro de jî jinên ku bûne xwediyên çîrokên balkêş û serdemî hene. Dibe ku ew ne xwediyê çîrok û serpêhatiyên efsanewî bin, lê wan di roja îro de berxwedan û têkoşîna hemdemî meşandine. Di ziraviyên jiyanan wan de, em ê bibînin ku wan jin û dayîkan çiqas li hember zihniyet, malbat û jiyanê li ber xwe dane. Bi van serpêhatiyan re hêjaye ku em wan dayîk û jinan jî bikin şopek



ji dîrokê, weke efsaneyên ku di dîrokê de hatine ziman.

### Serpêhatiya dayîka Xedîce

Yek ji wan dayîk û jinên ku em ê balê bikşînin ser Dayêka Xedîce Dawud a 76 salî, ji bajarê Qamişlo ku dayîka Şehîdekî ye û xwediyê çîroka jiyana xwe ye. Dayîka Xedîce jina ku ji ronahiya roj û jiyanê ji du saliya xwe ve bê par jê maye ye. Dayîka Xedîce di îfadekirina jiyana xwe de ji rojnameya me re, jiyana xwe, girêdanbûna xwe bi Tevgera Azadiyê û Serokatî re her wiha ji zehmetiyên jiyanê hunendina awaz û dengbêjiya xwe dike.
Dayîka Xedîce dibêje ku bavê wê kesekî ku muxtartiya 2 gundan dikir û dihat naskirin, rûxmî ku ew di encama nexweşiyekê ji dema zarok bû û bê xemiya malbatê de şewqa her du çavên xwe winda kiribû jî, bavê wê ew zewicand. Bi qasî ku jîr û jêhatî bû ev nexweşî ji xwe re nekiribû astengiya jiyanê. Bi vî awayî dayîka Xedîce bû xwediyê 8 zarokan 4 xurt 4 keç.

### Dayîka Xedîce û girêdanbûna wê ji Tevgera Azadiyê re

Lawê wê yê Şehîd Mihemed bi nasnav Ebas, Şehîd Ebas di 1987’an de soz da û di 90’î de derbasî çiyayan dibe. Di 28’ê Adara 1994’an de Şehîd dikeve. Bi naskirina Tevgera Azadiyê re ew gelek ji felsefeya Rêbertî bandor bû û di wê demê de bibû jina herî çalak di kar û xebatê tevgerê de. Dayîka Xedîce bi kombûna grûbek ji ciwanan ku wê berê xwe bidin çiyayê azad, lawî xwe bi destê xwe tevlî nava şoreşê dike. Roja wê biçe, ji wî re xwarina herî xweş li ber dilê wî amede dike û rê dike û di wê şevê de helbestekê amede dike . Dayîka Xedîce dibêje ku ew di destpêkê de dema hevalên lawê wê Mihemed dihatin û diçûn gelek ji rêxistinê aciz dibû. Lê wiha jî lê zêde dike ku dema civîn di taxê de dihatin çêkirin, wê guhê xwe dida ser. Dema têdighêje rastiya Apoyî û rêxistinê, êdî ew vê xetê dike armanca xwe a sereke. Û qeydên deng yên hevalan peyda dike û guhdar dike.

### Xwediyê bîrwariya bi hêz

Tevî taybetmendiya jiyana wê a tenduristî lê dayîka Xedîce di dil, giyan û mejiyê xwe de dibe helbestvan û dengbêj. Hestên xwe bi rêya hunera di dilê xwe de rêz dike. bi vê yekê re dayîka Xedîce dibe bi girêdanbûna xwe bi Rêbertî re û dengbêjiya xwe, di nava jiyana civakî de dibe xwediyê kesayeta herî bi bandor. Di şan û şînan de weke jina herî bi hêz û muxatebkar tê nêrandin. A herî balkêş ku ew mejiyê xwe ji xwe re dike hafîze û weke lênûsekê ku her tiştî li ser dinivsîne bi kar tîne. Dema min pirsa yadê kir ku kî ji te re helbest û stranan dinivîse? Bi van gotinan bersiva min dide… Ez tu carî nanivisînim, di mejiyê xwe de dinivîsim û dema diçim civatan, ser şehîdan û şahiyan tên bîra min û dibêjim.

### ‘Bila ciwanên me xwedî li keda şehîd û rêbertî derkevin’

Di dawiyê de dayîka Xedîce jiyana xwe bi van gotinan ji me re vedibêje: “Dilê min pir bi eşq e, dibe ku min ronahiya jiyanê nedîtibe, lê min jiyanek di mejiyê xwe de avakir. Ez ji ciwanên niha tiştekî dixwazim, tenê bila beriya her tiştî layiqî keda Serokatî, Şehîdan û girtiyên di zîndanan de derkevin. Bila ciwanên me li ser van esasan jiyan bikin û daxwaza min beriya ku koça dawî bikim, ez tenê rojekê Rêber Apo bibînim”.
Yadê Xedîce herî zêde li ser Şehîdan, Rêbertî û Gerîlayan stran û dengbêjiyê li hev dihune. Yek ji berhemên wê a bi dema biryara HTŞ’ê ji bo nuxmandina jin derketiye rê, ji me re anî ziman û strana wê wiha bû:
Jina Kurda tu kole bû, keça Kurda tu kole bû
Tu dibin zilm û zorê de bû, tu di bin zilm û zorê de bû.
Dema serok hat meydanê bi fikirê re tu rizgar bû, dema Apo hat meydanê bi fikrê re tu rizgar bû.
Jin girtî bû roj û şevê, jin nikarî bû derkevê serok derî ji me re vekir, em dixwînin vê felsefê.
Keçê Kurdan pir hêjane yek Arîne yek Barîn e, keçê Kurdan pir hêjane yek Arîne, yek Mizgîne, yek Zîlane û yek Şîlan e rêbera we Bîrîtan e, rêbera we qomîtan e.
Bijî bijî rêberê me, bijî bijî serokê me. te jîn û jiyan daye me, te jîn û jiyan daye me te jîn kir nirxê şoreşê, te xwaşkir jiyana me, te jîn kir nirxê şoreşê te xwaşkir jiyana me.

# Jinwar cihê jinên berxwedêr û kedkar e

Asya Weşûkanî

Jinwar gundê navdar ê jinan e ku xwedî wate û girîngiyeke pir cuda ye. Em hemû jî dizanin ku piştî Star kent cihê textê xwedawenda jin a navdar Nînhûrsak ku navê wê tê wateya dayika xwedawend a çiyayî. Cara yekê ye ku warekî jinan ê taybet û serbixwe têye çêkirin. her çiqasî hin jin diferqa wateya gundê jin war de nebin jî, lê tekez gerek were zanîn ku wateyeke gund a civakî, siyasî û exlaqî heye û gerek ji hêla hemû jinan ve li ser were lêkolîn kirin. Jinwar ciyê hêza jinan ê komîye û ciyê kedê û têkoşînê ye. Ciyê vîndarî û bi xwe bawerbûna jinên çalakvane. Weke ku em hemû jî dizanin ku ciyê jin û zarokên bêkes xwedî derketina, tevgera jin li wan bêkesan erkeke mirovîye û cara yekêye ku pirojeyeke wiha qîmetdar ji jinan re; têye sazkirin û tekez gerek wateya wê ya dewlemend were, naskirin û xwedî lê were derketin.
Ji bo ku mirov weke jin li gundê xwe xwedî derkeve û wateyê, lêbarbike tekez gerek li ser wateya wê lêkolîn bike û bi hurmet nêzîkatî; jêre bide raber kirin. Gundê Jinwar ciyê jinên berxwedêr û kedkar e. Dema ku Jinwar an jî warê jinê têye gotin wê demê, civaka xwezayî û jiyana wê ya komînal têne bîra mirovan. Ez bi xwe weke takekes min gelekî kelecana û coş ji gundewarê, jinan girt û ez dibêjim. Gerek gelek gundên wiha hebin ji bo ku em weke jin xwedî, li hevdu derkevin û hevdû bihêz bikin. Ez weke jin dibêjim ku jiyana komî bi wate û pîroz e. Ji xwe pergala mêrperest û desthilatdar wiha li jinan kiriye ku, hevdû tehemûl nekin û ji hevdû hesûd bibin. Bi rastî tu tiştek tuneye ku bibe sedem ji bo ku jin ji hevdû, hesûd bibin û hevdû qebûl nekin û ya din jî gerek were; zanîn ku ger hesûdiyek hebe jî sedema xwe ji hişmendiya, mêrpereste û bandora wê digire.
Dema ku mirov dikeve nava gundê Jinwar de û bi wan dayikên, dilovan re niqaş dike dilê mirov fireh dibe û wiha li mirov têye ku kelecan û manewiyat ji wan dayik û zarokan digire û ya din jî, mirov kêfxweş dibe ku dibêje: Dêmekî ked û têkoşîna hevalên berpirsiyar encam, digire û mirov teşwîq dibe ku bibêje gerek em çend gundên din wiha ji jin û zarokan re vekin û xwedî li wan derkevin. Tekez gerek her kes jî xwe li ber wan de berpirsiyar bibîne û ji bo, pêşveçûna wan ked bide û bizane ku ev modela dayik û zarokên; çaxdaş ên pêşerojê ne. Gerek ji bo mêran jî pirojên wiha werin çêkirin, ji bo ku jin, mêr û malbateke wekhev û azad çêbibe; lê lazime şaş neyê famkirin û wiha li mijarê neyê temaşe kirin, ku wê ji mêran re jî gund werin çêkirin. Mebesta min ji çêkirina pirojeyên wiha ji bo mêran jî ewe ku, gerek mêr jî fêrî jiyana komî bibin û li ser pîvan û rêgezên, jiyana sosyalist werin perwerde kirin.
Ne jin û ne jî mêr lazime ji derveyî komînê nemîne , ji xwe yê ku ji derveyî komînê bimîne jî wê bibe niçîra pergala desthilatdar û şerê wan ê taybet û careke din ez dibêjim. Gerek jin û civak were perwerde kirin û rastiya pergala 30 hezar, salî a mêrê qatil kastîk pir baş û bi hurgilî fambikin û li dijberî wê; hişmendiyê bi dijwarî têkoşîn bikin û xwe di serkeftinê de, kilît bikin û bibêjin hêzî bese ji hişmendiya mêrperest, xasok, qatil û tundrew re. Ez careke din dibêjim gundê jin war gundê me hemûya ne û em, pir pêkêfxweş û dilgeş dibin û tekez gerek were zanîn; heyanî ku dawî li hişmendiya desthilatdar û kujer neyê wê ne wekhevî û ne jî, xuşk û biratî pêkwere naxwe gerek hemû ked û têkoşîna me ji bo jiyana wekhev û sosyalist be.



Jineolojî dest bi projeyên wiha sosyalist kiriye û weke ku, em hemû jî dizanin ku xwezaya jinê hîn zêdetir nêzî sosyalist bûnê ye û ya din jî civak li derûdora jinê; hatiye teşe girtin û ger ku jin zana bibe û xwe ji rewşa mal û milk, rizgar bike wê karibe mêr jî li ser wan rêgezan perwerde bike. Û wê jin karibe ku mêran ji wê hişmendiya mêrperest û desthilatdar, xelas bike û wan fêrî jiyana komî û civakî(Sosyalist) bike ji bo ku; pergaleke aşîtîxwaz û demokratîk çêbike û ew jî wê bi hêza kolektîf, yanî bi hêza her du zayendan wê pêkan bibe.



# Koma Arî bi govendên gelerî şahiyan xweştir dike

Ji ber ku ne her kes beşdarî mîhrîcan û festîvalên hunerî dibin, ciwanê Kurd yê bi navê Rawan Temo, bi armanca zindîkirina çanda Kurdî komeke govendê ji bo şahî û çalakiyan ava kir.. Rawan diyar kir ku, bi avêtina vê gavê wê çand û hunera gelê Kurd ya gelêrî di paşerojê de zindî bimîne.

Dilîn Ehmed/Qamişlo

Dîlana gelêrî hunereke ku mîrata welatekî an herêmekê diyar dike û armanca wê ew e ku, çandeke taybet di tevger û muzîka gel de bîne ziman. Lewra civak bi çand û hunera xwe tê naskirin. Koma govendê ya bi navê Arî ku beriya du mehan li bajarê Qamişlo hat avakirin jî, bi vê armncê ku çanda gelê xwe zindî bihêle, dest bi kar û xebata xwe kiriye. Koma Arî ji deh kesan pêk tê, pênc jin û pênc xurtin, ev kom ne tenê beşdarî çalakiyên hunerî dibin, herwiha bi muzîk, dîlan, stran û cilûbergên Kurdî, başdarî şahiyên zewacê jî dibin. Koma Arî yekem koma flklorî Kurdî ya ji bo şahiyên zewacê hatiye avakirin.
Demezrînerê Koma Arî Rawan Mihemed Temo ji rojnameya me re bi berfirehî behsa armanc, kar û xebatên koma xwe kir.
Rawan diyar kir ku ji ber şahiyên zewacê di dama dawî de bandorê li ser civakê dike, xwest ku girîngiyê bide çanda herêmê û di rêya wê re çanda Kurd hîn bêtir zindî bike.

### ‘Em stranên xêliyên zava careke din zindî dikin’

Rawan Temo wiha axaftina xwe berdewan kir: ``Bê gûman gelê Kurd xwedî çandeke dewlemend e, lê ji ber bindestiya bi salan eger gel li çanda xwe xwedî derneketa wê di dema me ye niha de bihate jibîrkirin. Em jî wek ciwanên vê civakê erkê me ye ku em parastina çanda xwe bikin. Di van çend salên dawî de ji ber pêşketina torên civakî, ev yek bala min kişand ku gelê me bi taybetî di şahiyiên zewacê de stran û kevneşopiyên çanda xwe ji bîr dikin. Bi armanca zindîkirina stran û flklorê kurdî ya gelêrî, min koma Arî beriya du mehan ava kir. Em stranên berê yê ku xêliyê zava digotin, dîlan û muzîka xwe di şahiyên zewacê de pêşkêş dikin.``

### ‘Em ji kêfxweşiya mêvanan moral digirin’

Li ser beşdarbûna wan ya yekê di şehiyê de Rawan Temo wiha bi lêv kir: ``Tevî ku ev du mehin me koma xwe avakiriye, lê beşdarbûna me ya yekê di şahiya zewacê de li bajrê Qamişlo beriyê çend rojan bû. Bi rastî ez bi xwe li kêfxweşî û hestên mêvana mam matmayî. Di çavên wan de hezkirin û kêfxweşî diyar bû. Em jî bi vê yekê pir kêfxweşbûn, lewra armanca me ev bû ku, gelê me di demên wiha de ku roj bi roj cîhan pêşdikeve, li çanda xwe vegerin û di hemû şahiyan de roleke girîng bidin flklorê xwe. Çimkî çand nasnameya civakê ye.``

### ‘Her bajarek xwedî govend û stranên taybet e’

Rawan diyar kir ku ew, ji bo şahiyên zewacê stran, dîlan û govendê ji her çar perçeyên Kurdistanê pêşkêş dikin. Herwiha ew helbestên kevin bi kar tînin lê bi muzîkeke nû. Rawan wiha got; ``Ji bo ku beşdar jî bi me re kêfê bikin, em pranî lêkolînê li ser stranên herî kevin dikin, lê bi muzîkek nû ku nifşên niha jê hez bikin. Bi vî rengî wê çanda me neyê jibîrkirin û têkeve dilê ciwanan de. Her bajarek li gorî wê em xwe amade dikin. Mînak stranên şahiyên zewacê yê bajarê Qamişlo ne wekî yê bajarê Dêrikê ye, yê Dêriyê ne wekî yê bajarê Dirbêsiyê ye. Li gorî çanda her bajarî em stranên xwe hilldibijêrin.``

### ‘Ji bo pêkanîna armnacê kar û xebat pêwîst e’

Li ser zehmetiyê ku di avakirina komê de hatin kişand û peydekirina amûran Rawan Miheme Temo axaftina xwe bidawî kir: ``Min ji zû ve dixwest ku vê komê ava bikim, lê ji ber derfetên min yên madî kêm bûn me zehmetî kişand. Lê ji ber ez û rêhevalên min yê komê bi îsrar bûn, em flklora xwe tevlî şahiyan û çalakiyên çandî bikin, me pereyên ku qezenc dikir, her yek ji me dibû alîkar bi kirîna amûr û cilûbergan. Bi vî awayî me koma xwe ava kir û gihiştin armnca xwe. Di perwerdekirina li ser dîlan û stranan em ti zehmetiyan nakişînin, lewra em endamên komê, ev çend salên di navenda çand û huner de dixebitin. Lê ji ber ku ev tecrûbeye yekê ye ku jin tevlî govenda şahiyên zewacê de bibin, hinkî me zehmetî kişand heta ku malbat derfet dane me. Lê di nerîna min de piştî lidarxistina Şoreşê yêdî jin jî di hemû qadên civakê de bûye xwedî roleke girîng û nerîna civakê ya neyînî bi xebata xwe ji holê rakiriye. Banga min jî ji gelê Kurd bi taybetî gelê Rojava re ew e ku, di hemû şahiyan de di hemû çalkiyan de, girîngiyê bidin çand û hunera xwe da ku neyê jibîrkirin, lewra em bi çanda xwe ya giranbuha tên naskirin.``

### ‘Qada ku rengê jinê tê de hebe, ew qad balkêş û taybettir e’

Aferîn Ebdullah jî ku yek ji endama vê komê ye li ser tevlîbûna xwe axivî û wiha got: ``Ev ne cara yekê ye ku ez tevlî koma govendê dibin, ji ber ku ev çar salên min ez di navenda çand û huner de di beşê govendê de cihê xwe digirim. Lê tecrûbeya min û ya hevlên minî yekê ku em tevlî şahiyê zewacê dibin. Tevlîbûna me û erêkirina me ji bo vê projeyê, yek jê ji hezkirina me ji çanda me re ye, ya din jî armanca me ya zindîkirina çanda me ye. Ev proje jî wê bihêle ku çanda gelêrî de di nava nafşên nû de zindî bimîne.``



Rawan Temo



Aferîn Ebdullah

### ‘Divê em bi xebata xwe nerîna neyinî li ser jinê ji holê rakin’

Aferîn diyar kir ku malbata wê jî bi vê biryara wê re alîkar bûn û ti astengê dernexistin pêşiya wê û wiha axaftina xwe berdewam kir: ``Bê gûman ne hemû malbat bi vê yekê re ne ku keçên wan tevlî karê çand û hunerê bibin bi taybetî govend. Sedema vê yekê jî piranî ji mejiyê mêr tê. Mirov dikare vê yekê jî bêje ku di civakê de li ser jinan du nerîn hene, yek jê hebûna jinê di hemû qadên civakê de girîn û pêwîst dibînin, nerîîna din jî wek şerm dibînin ku jin li pêşiya mirovan dîlanê bigire. Lê wekî malbata min ji bo tevlîbûna min ya vî karî herwiha ya vê projeya koma Arî, ti astenê dernexitin hole berovajî wê, wan jî hezkirina xwe ji vê projeyê anîn ziman. Lê mixabin hin hevalên min hene ji ber şerma wan ya ji civakê herwiha ji ber ne erêkirina malbatê, nikarî tevlî me bibin.``

### ‘Divê em girîngiyê bidin çanda xwe lewra ew nasnameye’

Aferîn Ebdullah wiha axaftina xwe bidawî kir: ``Ji bo ku çanda me ye dewlemend di demeke wiha de ku cîhan tev tê guhertin, neyê ji bîrkirin ya herî girîng û pêwîst xwedîderketina li çand û hunera gel e. Lewra ew nasnameya civakê ye. Em jî weke koma Arî bi coşeke mezin bi cilûbergên xwe yên Kurdî, bi hemû enerjiya xwe beşdarî şahiyan dibin ta ku çanda me di dil û mejiyên zarokên me de her wiha li cîhanê tev jî were belavkirin. Di nerîna min de gereke gelek komên bi vî rengî werin avakirin, lewra projeyên bi vî rengî her tim serkeftîne. Ji ber ku armanca wan pêşketina çanda civakê ye.``

# Di çêkirina cil û pêlîstokan bi tayê hirî cîhaneke wê taybet heye

Navenda Nûçeyan

**Selma Yûsif bi tayên hirî yên nazik, pêlîstokên biçûk çêdike û di çêkirina wan de ji xwe re cîhaneke bêdeng û hêsan hilbijartiye. Ew bi çêkirina pêlîstokan cîhana xwe bi gelek rengan dixemilîne.**

Ji nava qerebalixa cîhanê Selma Yûsif ya 28 salî bi çêkirina cil û pêlîstokên zarokan, ji xwe re bi tayên hirî yê rengarenga, cîhaneke taybet bê deng û hêsan hilbijartiyê. Di destpêkê de ev karê wê yê desta bi demê re bû mîna dirûvaniya nerm. Ew bebekên piçûk û pêlîstokên ku dişibin karekterên kartonên hezkirî yên mîna Sponge-Bob, kîvroşk, beq û kesayetiyên din ên şîrîn de bû afrîner.

### Ji hezkirina wê ya zêde ji vî karî re hewceyî perwerdeyan ne bû

Selma Yûsif ji rojnameya me re wiha behsa destpêkirina xwe ya karê li ser tayê hirî kir û wiha got: “Ev sê sal derbas bûn ku min dest bi vê planê kir, ku ji hezkirineke hêsan ya tiştên bi destan hatine çêkirin çêbû, lê bi saya medya civakî û bi temaşekirina vîdeoyan min dest bi hînbûna vê hunerê kir ez tevlî ti perwerdeyan jî nebûm. Her tiştê ku ez bixazim çêbikim, ez ji înternetê xwe hîn dikim. Di destpêkê de tenê ezmûnek bû ku heta ez bi ser neketim çend caran têk çû, lê bi demê re ev kar ji bo min bû perçeyek ji roja min û ya bala min kişand ew bû ku yêdî ez nema dikarim dev jê berdim.”

### ‘Ez rehetiya xwe di afrandina karê xwe de dibînim’

Selma li ser hilbijartina xwe ya çêkirina tiştan bi tayê hirî wiha anî ziman: “Piraniya xebata min li ser çêkirina mîdalyayên biçûk û bebikên hirî ye ku karekterên kartonên hezkirî yên ku ji hêla keçan ve tên xwestin, bû. Lewra xebata van pêlîstokên piçûk ya pratîk hêsan e. Ez dikarim di nava



du saetan de, çêkirina pêlîstokekê biqedînim. Ev yek ji bo min jî hêsane lewra ez sibehê dixebitim, lê gava ez vedigerim malê, ez rihetiya xwe ya rastîn di afrandina bi hirî dibînim.”

### Armnaca wê ji çêkirina perçeyan ne qezenckirina pereyên zêdeye, biqasî hezkirina wê jê re ye

Bi qasî ku Salma, dixwaze parçeyên ku destdaneke taybet hildigire biafirîne, ew qasî hewl nade ku hejmareke mezin hilberîne. Her bebeka ku ew çêdike, bi hezkirin dihûnîne û dikeve dilê xwediyê xwe de. Ji ber vê sedemê, daxwazên keçan zêde bûne, ji ber ku dizanin her perçeyek çîrokeke wê biçûk heye û bi hezkirin hatiye çêkirin. Ji ber ku armanca Selma ne qezenckirina pereyên zêde ye tevî ku karê desta ne karekî hêsane, lê ji ber hezkirina wê jê re her pêlîstokekî ji deh hezarê lîreyên Sûriyê derbas nake û ew jî wan difiroşe dikaneke pîşeyên destan ya nêzî nexweşxaneya Ferman ya bajarê Qamişlo. Lê buhayên parçeyên mezintir li gorî dem û zehmetiyan digihîje zêdetirî 500 hezar lîreyên Sûriyeyê.

### Di peydekirina hin cureyên hirî de zehmetiyan dikşîne

Selma Yûsif diyar kir ku tişta li pêşiya wê dibe asteng, peydekirina hin tayên hirî û rengê ku ew dixwaze. Selma wiha got; “Zehmetiyên ku carnan tê pêşiya min ew e ku, ez daxwaziya xwe ya cureyên hiriyê û rengê li bazaran peyda nabin. Carinan bi rojan li cureyeke taybet digerim mîna ku mirov li xezîneyê digere. Lê belê ev yek nahêle ku ez dev ji karê berdim, perovajî wê ez bi îsrasrtir dibim ku bibim afirînerên tiştên nû.”

### Ji dem buhertinê bû heskirineke ji dil û afrandin

Ji bo Salma, hirî ne tenê bûye jêhatiyek, ew niha bi çêkirina cil û pêlîstokan ji xwe kiriye mîne bêhnvedanê ji cîhaneke ku ji dengê jiyanê direve. Wê bi van gotinan pênase dike: “Dema ku ez dest bi kar dikim, ez her tiştî ji bîr dikim. Ez wisa hîs dikim ku li cîhaneke din a tijî reng dijîm. Îro piştî xebata sê salan û jêhatiyê ji dembuhertinê zêdetir dibînim. Lewra karê min yê çêkirina tiştan bi tayê hirî, ji bo min bûye projeyeke biçûk ku xeyalên mezin pêk tinin. Ez gihiştime wê baweriyê ku dema mirov li ser tiştên ku jê hez dikin bixebite, bê gûman wê bigihêje armanca xwe û têkeve wê baweriyê ku tiştên ji dil tê çêkirin, di dilê mirovên derdorê jî cihekî taybet digire.”

# Li bajarê Dêrikê 41 gundên Beravê hene

Li herêma Dêrikê 41 gundên Beravê hene û her gundek xwedî taybetmendiyeke cûda û bi nirx e. Ji wan 3 gund vala ne, tu kes di wan de jiyan nake, 32 gund niştecihên wan Kurd in, 4 gund niştecihên wan Xiristyan in û 3 gund jî niştecihên wan Ereb in.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Navên gundên Beravê wiha ne: Êndîwera Banî, Êndîwera Xwarê, Pilêsiyê, Tilêlûn, Rikava, Xirabreşka Beravê, Çemşeref, Zihêrî, Selûmiya Xwarê, Selûmiya Banî, Dêrika beravê, Mezra Xwarê, Mezra Banî, Rihanîk, Qidêrîk, Kasan, Girzêrîn, Borizê, Kanîkerik, Hekemî, Kanî Mitirbê, Zixat, Kanî Nermê, Berebeyt, Pirik, Gerdemê, Ênbazoq, Ên Elxidra, Baneqesir, Qeserdîb, Hebilhewa, Tildar, Bazindanê, Bacirîq, Qerexrabê, Meamirê, Elehmediyê û Qesrok.

Di nav van gundan de 32 gund hene kurd têde dijîn, hijmara malbatên ku têde hezar û 100 malbat in ku nêzî 7 hezar kesî hene. Di heman demê de 4 gundên xiristiyanî jî hene 30 malbat di van gundan de hene ku nêzî 300 kes têde hene. 4 gundên pêkhateya ereb hene 370 malbatin û nêzî hezar û 500 kesî ne.

Di van gundan de gelek eşîrên Kurdan hene ji wan; Xerzan, Çiyayî, Hesina, Bawelî, Botî, Dêrşewî, Şikakî, Basiqlî, Torî, Harûnî, Teya, Elîka, Dêmanî, Ezîza, Garisî, Kiça, Batûyî û Dîdara.

Eşîrên netewên ereb jî Begara, Reiyan Eloca û Zûbeyda.

Eşîrên xiristiyanî; Ji ber ku xiristiyanî ji Bakurê Kurdistanê ne piraniya eşîrên wan bi navê wan deran wek eşîra Hezexî, Tora, Mardînî, Bota.

### Cihên dîrokî di gundên Beravê de

Gundê Êndîwer taybetmendiyeke wê heye ku bi Cizîra Botan ve girêdayî ye û cihê wê bilind bû û bazar têde hebû, gel berê xwe dida Êndîwerê. Di heman demê de hin gir di van gundan de hene dîroka van gira vedgere hazarê salan; Girê di navbera Rikava û Zihêriyê de, girê Zixatê, girê Başotê, Girê Qeserdîbê û heya dighêje cizîra botan û ji Cizîra Botan heya dighêje Zaxo. Di dema berê de bi riya van giran gel diçûn cem hev û bazirganî dikirin, lewma ev wek girên dîrokî tên naskirin. Her wiha ev gund bi pirbûna kanî û ceman dihatin naskirin, kaniya herî kevin li gundê Êndîwerê ye bi navê Kaniya Xeyda tê naskirin. Di dema berê de nêzî 800 milîm baran li van gundan dihat barîn, her tişt li wan gundan dihat çandin. Di her gundekî ku çem derbas dibû û gundiyan aş ji xwe re ava dikirin û debara wan li ser van aşan bû. Berî 5hezar sal dema jinê destar afirand û dan bê dihêra, êdî mêr ev yek ji jinê bir û aş avakirin. Aş li gundê Kasanê, Baneqesir, Zixatê, Zihêriyê hebûn lê di dema niha de hatine sekinandin. Her wiha çend mezelên kevnar jî hene gel berê xwe didiyê û baweriya wan pê tê wek mezela Eliyê Şêr di navbera gundê Qidêrîk û Rihanîkê de ye. Mezela Şêx Periyê di navbera gundê Zixat û Zihêriyê de ye ev mezel vedgere berî 3 hezar sal, di heman demê de mezelên xiristiyaniyan jî hene.

### Şêwazê jiyanê di dema berê de

Di dema berê de şêniyên herêmê sewal xwedî dikirin, dema mirov berê xwe dida kîjian gundî garaneke wan a sewaldariyê hebû. Di heman demê de hesp û mehînên wan jî hebû da ku barê xwe pê bigerînin û pê herin gundan. Di wê demê de mirov netenê sûd ji şîr û goştê wan sewalan didîtin di heman demê de ji hiriya wan cil çêdikirin. Di dema berê de her tişt xwezayî bû û rihê komînal hebû herkesî destek dida hev çi di milê çandiniyê de yan di milê sewaldariyê de. Lê di dema niha de her tişt hatiye guhertin heya dirûvê mirovan jî, ji ber vê yekê Rêber Apo jî dibêje divê mirov vegere rastî û dîroka xwe. Di dema berê de pere, rasmaliyet nebû dema mirov tiştek jêre pêwîst be hin berhemên malê dibirin û li beramberî wan tiştên pêwîst ji bo xwe tanîn.

### Wateyên navên gundan

Gelek gund hene heta niha wateya navên wan nehatina famkirin lewma lêkolîn li ser wan tên çêkirin, lê gundên ku wateya navên wan hatîn tekezkirin ev in;

Zihêriyê wateya wê ji zû hêr hatiye, ji ber ku di dema berê de du çem dihatin li ser gund û dema aş li wir çêkirin genim zû dihat hêrandin lewma navê wê kirin zihêriyê.

Baneqesir di dema berê de koçer ji deştê diçûn zozana ji bo sewaldariyê, dema diçûn banê xwe li vî gundî datanîn û di gund de qesrek jî hebû lewma navê gund bû Baneqesir.

Zixat ev nav lê hat kirin ji ber ku di dema berê de gelek kanî têde hebû û roj bi roj zêde dibûn lewma ev nav ji zayînê anîne, her wiha hin dibêjin ku siryaniyan ev nav lê kiriye ji ber ku axa wê berhemdêr bû her tişt têde dihatin çandin.

Kasan hin dibêjin ku navê wê ji du qedehan hatiye.

Girzêrîn girek di gund de hebû zêr têde hebûn, lewma dibêjin ew gund dewlemend bû bizêran navê wê bû Girzêrîn.

Qeserdîb di dema berê de kesek bi navê Dîb hebû ji bo xwe qesrek ava kir lewma navê gund bû Qeserdîb.

Kanîmitirb di vî gundî de kanî hebû û mitirban berê xwe didanê û konê xwe divedan, ev nav lê hat kirin.

Hekemiyê ji ber ku Siryaniyan avakiriye navê bav û kalên xwe lê kirine.

Pirik navê Pirik li vî gundî hatiye kirin ji ber ku di gund de pirek hebû.

Berebeyt navê Bere Beytê Bar Bêto bû dema hat avakirin, tê wateya ibn Eldar.

Çemşeref mala Çeto ev gund avakirin, dibêjin çemek di gund de hebû ew cem navê şeref lê kirin lewma navê gund bû Çemşerf.


Rikava du malbat hebû ji bo vî gundî şer dikirin û ji rik hev de ev gund ava kirin lewma navê wî bû Rikava.

Rihanîk ev nav lê hat kirin ji ber ku bi rihana navdar bû hertim Rihan li wir çêdibûn.

Xirabreşka Beravê navê vî gundî vedgere gundê Xirabreşka li Bakurê Kurdistanê.

Elehmediyê ji ber ku ev gundê netewê erebe navê gund li ser navê Şêxê eşîra wan Himêdî, hin guhertin kirine di nav de û xistine Elehmediyê.

Qidêrîk ev nav li vî gundî kirin ji ber ku hingî qeder dihatin serê xelkê li wir.






# 'Projeyên Îsraîl û Tirkiyê li Sûriyê'

Lêkolînerê li Navenda Firat a Lêkolînan Lezgîn Ibrahîm diyar kir ku projeyên Tirkiyê û Îsraîlê ji bo Sûriyê û giştî herêmê hene, projeya Tirkiyê ya dagirkeriyeke berfireh ku dixwaze dîsa Osmaniya nû vegerîne, li hemberî wê plana Îsraîl ji bo guhertina Rojhilata Navîn piştî şerê Xezayê heye û got, "Hikumeta Şamê ketiye du nakokiyan, razîbûna Îsraîl û bandoriya Tirkiyê."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê xalên ku siyaseta Îsraîl û Tirkiyê li ser Sûriyê dibin yek û xalên nakok di navbera wan de, lêkolînerê li Navenda Firat a Lêkolînan Lezgîn Ibrahîm bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Rewşa Sûriyê piştî hilweşandina rêjîma Baas ber bi ku ve çû ye û niha çi guhertin li ser axa Sûriyê tên kirin?**

Piştî ketina Esed di rewşa Sûriyê de gelek guhertin çê bûn, guhertinên li ser asta Sûriyê û guhertinên bandora ketina Eseed li ser rewş û siyasetên herêmî di herêmê de. Ji ber bi ketina rêjîma Esed re gelek hevsengî hatin guhertin. Berê Esed alîgirê Îranê bû û destê Îranê di Sûriyê de gelekî xurt bû. Milîsê Îranê tim li başûrê Sûriyê ji bo Îsraîlê gefek bûn, hem jî pevçûnên wan heta demeke dirêj di Sûriyê de di asteke nizim de bûn. Lê di demên dawî de piştî şerê Îsraîl û Hemasê û berî ketina rêjîmê, ev pevçûn gihaşte asteke bilind. Vê yekê hişt ku şerê Îsraîl sînorên Xezayê derbas bike û bighêje Sûrî û Libnanê ku me dît çawa berî rêjîma Baas hilweşe, Îsraîl hemû milîs û serkirdeyên Îranê yên ku li Sûriyê ne, tesfiye kirin. Qelisbûna Esed di wê de rê de çê bû û ev yek bû sedemek ji ketina wî. Roleke sereke ya Îsraîlê di ketina Esed û derxistina destê Îranê ji Sûriyê hebû. Di van 13 salên ku li ser şerê Sûriyê re derbas bû, Îsraîl tim xwe wek bêalîyekî şer nîşan dida, lê piştî şerê Xezayê ew rasterast kete Sûriyê û piştî hilweşandina Esed roleke sereke di rewşê Sûriyê de lîst. Ev yek metirsî li cem Tirkiyê da avakirin, bi taybetî piştî derxistina Îran ji Sûriyê ku Îsraîl naxwaze ew bibe gefeke nû li ser wê. Ji ber wê niha li başûrê Sûriyê mîna Siwêda, Quneytera, Deria û di wan herêman de liv û tevgera Îsraîl gelek zêde ye ku nahêle tevgera komên girêdayî Hikumeta Veghuhêz a Şamê û çekên giran derbasî wir bibin, hem jî çi bargehên leşkerî yên li wan herêman lê dide, niha hevkêşî bi vî rengî hatine guhertin.

**Xalên ku siyaseta Îsraîl û Tirkiyê li ser Sûriyê dibin yek û xalên nakok di navbera wan de çi ne?**

Îsraîl dibêje pêwîst e Sûriyê piştî Esed nebe metirsî li ser min û çi ji bo wê pêwîst bike ez ê bikim. Metirsiya Tirkiyê ji vê yekê mezin bibe, lewma hewil dide niha Sûriyê bixe bin serweriya xwe ji aliyê leşkerî, siyasî, aborî û hwd… ku êdî ew bibe şûna Îranê di Sûriyê de. Berê çawa Esed girêdayî Îranê bû, niha Tirkiyê dixwaze ew wê rolê bilîze ku hikumeta veguhêz a Şamê û hemû komên li derdorê wê, bixe bin destê xwe û li gorî xwe wan bigerîne. Ev hişt bingûhevketinek di navbera Tirkiyê û Îsraîl li ser axa Sûriyê çê bibe. Ji ber her yek projeyeke cûda ye. Projeya Tirkiyê ya dagirkeriyeke berfireh heye ku dixwaze dîsa Osmaniya nû vegerîne. Li hemberî wê Îsraîl nehêle ku dîsa Sûriyê bibe cihê gefê li ser wê û plana Îsraîl a nû ji bo guhertina Rojhilata Navîn piştî şerê Xezayê, heye. Îsraîl istratîjiya xwe diyar kir dixwaze Libnan, Sûriyê, Îraq, Îran û hemû dewletên ku destê Îranê tê de xurt bûn, lewaz bike, wê ji van herêman derxe û bixe bin serweriya xwe. Ji ber wê ev sedema yekemîn ku niha pevçûn navberî Îsraîl û Tirkiyê derkete pêş, tevî ku berî ketina Eseed pevçûneke veşartî di navbera wan de hebû, li gelek cihan jî alîkarî û têkiliyên wan bi hev re hebû, bi taybet têkiliyên bazirganî, lê rewş niha hate guhertin, ji ber 2 projeyên cûda û di armancên cûda ya herdû dewletan li herêmê bi taybet li ser Sûriyê hene.

**Tevî nanokiyên di navebera Îsraîl û Tirkiyê de, lê hevpeyman û têkiliyên wan jî bi hev re hene, gelo wê ev nakokî bandora xwe li van têkiliyan bike yan na?**

Tirkiyê wek endamekî di NATO'yê de ye, NATO jî alîgirê Îsraîlê ye, heta demekê gelek hevpeyman di navbera van her dû dewletan de li ser asta bazirganî ya kirîn û firotina çekan û perwerdekirinên artêşan hebû. Herwiha Tirkiyê piraniya çekên pêşketî ji Îsraîl dikirî û li hemberî wê jî Tirkiyê betrol, gaz û hwd… dişande Îsraîlê ku di navbera wan de xalên ku her dû alî sûd ji hev werdigirin hebû û heye niha jî di aliyê bazirganiyê de ev yek berdewan dike. Ji bo wê ew naxwazin niha bi nakokiyên xwe bandorê li têkilî û bazirganiyên di navberî xwe de bikin. Lê ev yek gihaştiye astekê ku muhtemele ev têkilî werin qûtkirin. Ji ber Îsraîl xwe ji Tirkiyê re danaxe û projeya xwe di Rojhilata Navîn de pêk tîne. Di demên dawî de daxuyaniyên Nitinyaho hebû ku dibêje; Erkeke Pîroz li ser milê min e ku em Îsraîla mezin ava bikin, ev jî baş dide xuyakirin ku projeyekî berfirehkirinê ya Îsraîl di herêmê de heye. Ji xwe Tirkiyê nedixwest Eseed bikeve û ne jî Îran têkeve rewşeke xirab de. Ji ber ew dizane sîstemên dewletên navendî, olî û netewî di herêmê de hiştiye Tirkiyê heya niha li ser lingan bimîne.

Piştî ketina Esed Tirkiyê dît nema dikare rê li pêşiya Îsraîl û projeyên wê bigire. Projeyên ku niha Îsraîl dixwaze li Rojhilata Navîn pêk bîne, projeyeke ku hemû dewletên berê di bin destê Îranê de bûn hilweşin. Li şûna wê sîstemên nenavendî yan jî awayên fedralî ku hemû pêkhateyên di van dewletan de bikaribin mafê xwe bibin û têkiliyên van dewletan bi Îsraîl re çê bibin. Ew jî li ser bingehekî aborî ku ew dixwaze kontrolê li ser hemû rêyên aborî di Rojhilata Navîn de bike û dewletên weke Libnan, Sûrî, Îraq, dewletên Erebî û yên derdorî Urdin hewcedarî Îsraîl bin ku ew aboriya wan birêve bibe û ev dewlet mecbûr bibin ku têkiliyên xwe bi Îsraîl re baş bikin. Helbet heger ev jî çê bibe wê destê Tirkiyê ji van hemû dewletan qût dibe û nema dikare projeya xwe pêk bîne.

Ji ber wê Tirkiyê niha hewl dide bi qasî kare di Sûriyê de xwe xurt bike û piştgiriya hikumeta veguhêz bike ku bihêle ev hikumet di bin destê wê de be. Da ku li hemberî projeya Îsraîl raweste. Ya sereke ji bo Tirkiyê jî ku ev guhertinên Îsraîl ên nû di herêmê de çê bike, nehêle Kurd bibin xwedan maf an jî herêmên Kurdî bibin herêmên xweser û hêzeke leşkerî, siyasî di herêmê de ava bike.

**Rewşa Tirkiyê li hemberî Îsraîlê di çi astê de ye û metisiya Tirkiyê çi ye?**

Qonaxa ku li Tirkiyê dest pê kiriye ji bo qonaxa "Aştiyê" bi Kurdan û PKK'ê re, di bingeh de sedemên xwe ji metirsiya projeyên Îsraîlî ye, lê ne ku Tirkiye dixwaze rast bi Kurdan re aştiyê pêk bîne û mafê Kurdan bidê. Guhertinên di demên dawî de û lewazbûna Îranê ku baş hate xuyakirin û destpêkirina Îsraîl ji bo berfirehkirina herêmên xwe, di heman demê de metirsiya ku Îsraîl piştgiriya Kurdan bike yan jî ji Sûriyê heya Îraqê korîdor di navberê Kurdan û Îsraîl de were vekirin. Vê hişt Tirkiyê bilez pêvajoya aştiyê bîne holê û bihêle projeya Îsraîl heya dawî bi serî neçe, hem jî hewl bide Kurdan dîsa bixe bin bandoriya xwe û tu mafên zêde nede wan ku Kurd serxwebûna xwe bistînin. Lê din bin sîwan Tirkiyê de tev bigerin, lewma ev pêvajo dest pê kir. Rewşa Tirkiyê di demên niha de li hemberî projeyên Îsraîl gelekî lewaz e. Îsraîl bi siyaset, aborî û hêzên xwe yên leşkerî ji Tirkiyê bihêztir e û dikare di van herêman de tevger bike. Lê Tikriyê piştî hilweşandina Esed û vekişandina Îranê xwe di herêmê de lewaze dibîne û nikare li hemberî Îsraîlê di demên dûr de bisekine. Lewma niha hewildanên xwe li ser 2 astan dilîze, astekê ku di Sûriyê de dîsa xwe xurt bike û hikumeta veguhêz li ser Kurdan gur bike. Aliyê din jî di hundirê Tirkiyê de ku Kurdan bi pêvajoya aştiyê heta demeke dirêj mijûl bike, heta ku binere rewşa wê û Îsraîl bighê çi astê, lewma heya niha jî Tirkiyê di pêvajoya aştiyê de tu gavên pratîkî û rast neavêtiye.



**Hikumeta Şamê di vê bazariya ku li ser Sûriyê tê kirin li ku re?**

Hikumeta Veguhêz a Şamê hikumetekî ku di koka xwe de îslamî, cîhadî û demên ku hate ser desthilatdariyê jî ne ku bi hêza xwe hate, lê bi hevpeymanên navdewletî û herêmî hate. Dewletên ku Ehmed El-şeri anîn ser desthilatdariyê armacên wan ên sereke ku hêzeke îslamî radîkalî li dijî Îranê were ser desthilatdariyê. Lê ji wan re ne pêwsît e ew terorîste an ne terorîste, ya girîng ev hikumet nehêle Îran di Sûriyê de çalak bibe, heta ku Îsraîl rewşê xwe ya Xezayê zelal bike, hem Emrîka û Rojava hevpeymanên xwe bi Îranê re bi taybet ji bo çekên noklerî wê zelal bikin. Ji bo wê hikumeta Şamê ya niha li şûna Esed roleke wezîfî dilîze, ne ku hatiye ji bo bibe hikumeta Sûriyê ya siberojê. Hikumeta Şamê niha ketiye navberî 2 nakokiyan yek jê dixwaze Îsraîl razî bike, di aliyê din de jî nikare di bin bandoriya Tirkiyê de derkeve. Her dû alî jî nakokin û zextên her dû aliyan heye. Tirkiyê dixwaze niha di hin rêyan de vê hikumetê xurt bike, ew jî bi hincetên bazirganî û jinûve avakirina Sûriyê û artêşa Sûriyê. Lê ev yek dîsa rastî nerazîbûnê Îsraîl hat ku di demên dawî de hemû navendên ku Tirkiyê nîşan kiribû tê de bargehên xwe çê bike, kir armanc. Lewma hikumeta Şamê di navberê her dû aliyan de bê bandor maye. Ji bo wê hewldanên xwe di asta ku Îsraîl razî bike ji bo wê li ser desthilatdariyê bihêle û Tirkiyê dixwaze şeriyeta xwe li Sûriyê pêk bîne. Ev hemû jî demikî ne, heger sîstemên Sûriyê nebe hevbeş ku hemû pêkhateyên Sûriyê nebin cih di vê hikumetê de wê tu aramî di Sûriyê de pêk neyê.

# Kiryarên dijmirovî yên hikumeta veguhêz a Sûriyê!

Bi dirêjahiya 8 mehan ji rûxandina Rêjîma Baas, hikumeta veguhêz a Sûriyê gelek komkujî li ser gel pêkanîn û di encamê de 7 hezar û 449 kesên sivîl hatin kuştin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

### Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê kiryarên hikumeta Sûriyê

Piştî rûxandina rejîma Baas êdî hemû komên çete yên di bin serweriya Artêşa Niştîmanî ya Sûriyê û bi piştgiriya dewleta Tirk a dagirker êrişî Minbicê, Til Rifetê û Şehbahê kirin. Armanca dagirkeriyê ya sereke ew bû ku Kobanê û Bendava Tişrînê jî dagir bike. Êrişên dagirkeriyê 149 rojan li ser hawirdorê berdewam kir, 25 sivîl û gelke şervanên QSD'ê li ser destê çeteyan û dewleta Tirk hatin şehîdxistin, lê planên çeteyan ji bo dagirkirinê bi ser neketin. Piştî peymana 10'ê Adarê hat îmzekirin êdî heya radeyekê baş şer û êrişên çete û dewleta Tirk li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê rawestiya. Lê piştî lidarxistina Konferansa Pêkhateyan ya ku di 8'ê Tebaxê li Hesekê çêbû, bi destê hikumeta Şamê di 9'ê Tebaxê de peymana 10'ê Adarê hat binpêkirin. Binpêkirina peymanê bi êrişên komên çete, dewleta Tirk û hikumeta veguhêz a Şamê li Dêr Hafir, Dêrazorê û Bendava Tişrînê hat kirin û ji wê demê ve heta roja îro zêdeyî 20 caran binpêkirina peymana 10'ê Adarê çêbûye. Di encama van êriş û binpêkirinan de zêdeyî 11 kes birîndar bûne.

### Berava Sûriyê

Li Beravê jî komên çete, çeteyên biyanî û artêşa Colanî êrişî Berava Sûriyê kirin, di 7, 8, 9'ê Adarê de zêdyî 1700 kes ji pêkhateya Elewî hatin kuştin, ev êriş heta roja îro didomin. Tevî ku Komîteya Şopandina Rastiyan ji bo komkujiyên Beravê di wê demê de hatibû avakirin, ranebûye. Ji rûxandina rêjîmê heta meha Nîsana 2025'an zêdeyî 2 hezar 106 kesên sivîl li ser destên hikumeta Şamê ya veguhêz hatine kuştin. Komkujî, talankirin û hemû cureyên binpêkirina bi awayekî veşartî û bi hinceta bermahiyên rêjîma Baasin tên kirin.




### Teqîna Dêra Mar Elyas

Di 22 Pûşbera 2025'an de, li Dêra Mar Elyas a Şamê teqînek çêbû. Di encamê de, 25 kes hatin kuştin û 63 kesên din birîndar bûn. Tevî ku Hêzên Ewlehiyê yên hikumeta veguhêz a Şamê çavên wan vekirî bû, hem jî hebûna istixbarata dagirkeriya Tirkiyê li şamê nayê jimartin ev teqîn çêbû. Ev teqîn ji bo pêkanîna jenosaydên mezin di derheqê xiristiyanan de bû.

### Komkujiyên hikûmeta Şamê li Siwêdayê

Ji destpêka sala 2025'ê heta îro li herêma Swêda têkoşînek girîng û giran ji hêla Durziyan ve hat raberkirin. Di meha Nîsan û Gulanê de, li dijî pêkhateya Durzî kiryarên qirêj ji hêla hikumeta Şamê ya veguhêz ve pêk hatin. Roja 13'ê Tîrmehê, bi destê HTŞ'ê tevlîheviyek di navbera Durzî û Erebên Bedû de çêbû. Roja 26'ê Tîrmehê, hejmar di navbera hezar 120 kes heya hezar 420 kuştî hatin ji hêla Rewangeha Sûrî ya Mafê Mirovan ve hat belgekirin. Tevî vê, Tora Neteweyî ya Mafê Mirovan (SNHR) hejmaran bi hêmanek heftane nivîsand: 169 kuştî di destpêkê de, paşê 558, û di dawiyê Tîrmehê de 814 kuştî û 903 birîndar piştrastkirin. Li gel vî şerî, bi qasî 93 hezar kes ji malên xwe koçberbûn. Di Tebaxa 2025'an de, "Parêzvanên Niştimanî" bi serokatîya Şêx Hikmet Elhecerî hat damezirandin. Li hemberî vê yekê jî da ku Sûriyê parçe bibe, hikumeta Şamê hilbijartinên parlemento yên Siwêdayê, hem jî Hesekê, Reqa û Dêrazorê bi paş xistin. Rewşa şer û nearamî li Siwêdayê berdewam e, tevî hewldanên rawestandina şer jî, hikûmeta Sûriyê şer û komkujiyan li ser gelê Siwêdayê didomîne, li gorî raporeke Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ji 13'ê Tîrmehê heta 26'ê Tebaxê nêzî 2 hezar kesî di geşedanên leşkerî yên Siwêdayê de hatine kuştin, 725 kes ji wan kesên Durzî bûn, ji wan jî 57 jin û 21 zarok in.

### Dorpêça li ser Şêxmeqisûd û Eşrefiyê

Bi destpêkirina alûziya Sûriyê re heta roja îro nêzî 10 caran dorpêç li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, ji hêla rêjîma Baas, hikumeta Şamê ya veguhêz û komên çete ve hatiye kirin. Lê piştî rûxandina rêjîma Baas û ji destpêka meha Tebaxê ve dorpêç li ser du taxên Kurdan ên li Helebê ji hêla hikumeta Şamê ya veguhêz ve tê meşandin. Hikumeta Şamê ji bo tîkirin, berçîkirin û qutkirina hemû pêdiviyên jiyanî li ser gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê siyaseta dorpêçkirinê da meşandin. Tevî ku di yekê Nîsanê de peymana di navbera meclisên herdu taxan û hikumeta Şamê de hat îmzekirin, lê ev peyman ji hêla hikumeta Şamê bin pê bû. Di encamê de nêzî 30 hezar malbat ji vê dorpêçê êş kişandin, ev dorpêç jî hîna didome û her ku diçe rewşa jiyanê li şîniyên bajêr ji hêla peydakirina kelûpelên xwarinê û sotemeniyê û hwd… ve zortir dibe.

### Hêviya gelên Sûriyê dawîbûna şer bû, lê şer gurtir bû

Omîda gelên Sûriyê bi hemû rengên xwe ji ketina rêjîma Sûriyê ew bû ku şer û kirîz bi dawî bibe û hemû li ser maseyekê bicivin, piştre hemû alî bibin xwediyê biryarê. Lê dewleta Tirk bi mîta xwe destwerdan kir da ku kirîzê kûrtir bike, hikumeta Şamê ya veguhêz jî da ser şopa rêjîma Baas. Vê hikumeta nû ji destpêka rûxandina rêjîma kevin re we kir berpirsê tevahiya Sûriyê, lê ji 8'ê Berfanbara 2024'an ve heta 6'ê Tebaxê li tevahiya Sûriyê 9 hezar û 889 kes hatine kuştin, ji wan 7 hezar û 449 kes sivîl in, ev serjimarî jî li gorî Rewangiha Sûrî ya Mafê Mirovan. Piştî 9 mehan hîna jî xewna Sûriyê pêkanîna sîstema nenavendî ji bo Sûriyê, li gel aramî, aştî, xurtkirina diyalogê ye, ev yek jî bi pêkanîna sîstema Rêveberiya Xweser çêdibe.

# Dagirkeriya Tirk sedema hemû aloziyan e

**Birûc Resûl**

Gelên ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li derdora Rêveberiya Xweser xwe bi rêxistin kirine û têkoşîna avakirina jiyaneke demokratîk û azad dikin, rojane rastî êriş û gefên dewleta tirk tên. Li hemberî gef, êriş û polîtîkayên dagirkeriya Tirk gelê heremê jî di hertim di nava berxwedaniyê deye. Bê guman deman ku dewleta Tirk a dagirker berxwedaniya gelê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibîne, her dixwaze bi rêbaz û êrişên cur bi cur vê berxwedaniyê têk bibe û hemû rêbaz û êrişan li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dide meşandin, bi armanca têkbirina sîstema Rêveberiya Xwerser. Li gor ewqas pilan û êrişan cardin negihîşt armanca xwe, niha jî diwaze ku şaneyên DAIŞ`ê ji nû ve vejîn bike, bi armanca ku jiyana bi ewle û aram li herêmê xirab bike û her dixwaze herem di nava alûzî û bi aramiyê de bimîne.

Tê xuyakirin ku dewleta Tirk tirsa wê ji destkeftiyên kurdan heye. Metirsiya herî mezin ya dewleta Tirk, sîstema demokratîk ya Rêveberiya Xweswer e ku hemû gelan û pêkhateyan di nava xwe de dihewîne û di nava pergalekî serbest û azad de dijîn û naxwaze ku ev pergal bibe mînak û nimûne li herêmê. wek tê zanîn ku li Sûriyê dewleta Tirk a dagirker li pêşiya avakirina sîstemeke demokratîk digre. Hikumeta Sûriyê ya veguhêz îro bûye mîna pêleystokekî di destê dewleta tirk û hin hêzên heremî û cîhanî de û tişta ku dixwazin û li gorî berjewendiyên xwe bi wê didin pêkanîn.

Têkiliyên di navbera Hikûmeta veguhêz ya Şamê û dewleta Tirk de wê bandoreke neyînî li ser Sûriyê û çareseriya alûziya sûriyê bike. Dewleta tirk hem dixwaze di milê siyasî, abûrî û leşkerî de serweriya xwe li Sûriyê pêkbîne û yê ku naxwaze aramî û çareserî li Sûriyê pêkwere di serî de dewleta tirk e.

Hemû komkujî û sûcên dijmirovî yên ku li Sûriyê hatine kirin û heyanî roja îro jî berdewamin bi destê dewleta tirk têne kirin. Heyanî ku dagirkeriya tirki li Sûriyê bi dawî nebe, wê her alûziya sûriyê berdewam bike. Ji milekî dewleta tirk qaşo behsa xuşk û biratiya gelan dike, lê berûvajî wê tişta ku dike ji vê gelekî dûre, êriş û gefên ku dewleta tirk dike nîşaneya vê yekê ye. Her kes gihiştiye wê baweriyê ku sîstema Rêveberiya Xweseriya Demokratîk çareseriya herî guncawe ji bona siberoja Sûriyê. Rêveberiya xweser bûye cihê hêvî û baweriya hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û ji bona parastina destkeftiyên ku bi xwîna şehîdan pêkhatiye wê biparêze û wê tucaran rê nede ku kes van destkeftiyan tar û mar bike û wê hebûn û vîna xwe biparêze.



# Bi banga aştiyê re dewleta Tirk pîvan û rêgezan bin pê dike

Dewleta Tirk a dagirker ji bo ku pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk berovajî bike bi hemû hêza xwe ketiye liv û tevgerê, li ser esasê konsepta qirkirinê li ser Kurdan her cûre êrîşan pêk tîne, di wan êrîşan de tu nirxên ol, bawerî û exlaqî nas nake. Mînaka wan êrîşan jî xirakirina gorên şehîdan, asgtengkirina lidarxistina merasîmên cenazeyên Gerîlayên HPG'ê û qedexekirina ziman e.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Bi banga Rêber Apo a ku di 27'ê Sibatê de hate kirin pêvajoyek dîrokî dest pê kir. Yek ji gavên herî berbiçav ên vê pêvajoyê merasîma şewitandina çekan yên PKK'ê bûn ku di 11'ê Tîrmehê de li bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê hate lidarxistin. Ev merasîm ji bo Rojhilata Navîn xaleke bingehên ya aştiyê bû. Bi damezrandina Komîsyona Hevgirtina Neteweyî, Xwişk-Biratî û Demokrasiyê" Ev Komîsyon lazime di serî de li ser prensîbên banga Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk bimeşiya. Ev prensîb di nav xwe de wekhevî, edalet, pirrengiya çandî, nenavendîbûn û beşdariya demokratîk digire. Rêber Apo di banga xwe de teqez dike ku meseleya Kurdan tenê bi rêya diyalogeke demokratîk ku hemû pêkhateyên civakê di nav xwe de dihewîne, dikare bê çareserkirin. Lê heta niha tişta ku ji komîsyonê û dewleta Tirk tê xwestin pêk nehatiye. Hêjî neqebûlkirina mafê Kurd û qedexekirina zimanê Kurdî û astengkirina li darxistina merasîmên gerilayên HPG'ê didomin.

### Aşitî tenê rawestandina şer nîne, aşitî demokrasiye

Rêber Apo bi pêşxistina banga aştî û civaka demokratîk re berpirsiyartî û gavên bingehîn ku lazime dewleta Tirk biavêta pêşxistibû, lê heta niha tê dîtin ku dewleta Tirk tu gavên şênber neavêtiye. Rûxmê ku PKK'ê merasîma îmhakirina çekan li darxist û agirbest ragihand. Dewleta Tirk ji bo dagirkirina axa Kurdistanê qadên gerîla bombebaran dike. Aşitî bi seknandina çekan pêk nayê aşitî bi çareserkirin û rakirina astengiyan pêkane.

### Dewleta Tirk goristana talan dike

Dewleta Tirk a dagirker bi salane li dijî Tevgera Azadiyê bê ku rêgeza nasbike şereke bê pîvan da meşandin, bi hemû teknîka xwe bi çekên qedexekirî û kîmyasalê êrîşên qadên gerîla kir. Ew jî têrê nekir gorên gerîlayên şehîd bi awayek hovane xirakir heman demê de cenazeyên gerîlayan bi kargoyan ji malbatan re şand. Dewleta Tirk ji 2015'e heta niha her cûre êrîş pêk anî, dijminatiya xwe ya li hemberê Kurdan gîhandiye wî astê ku heta niha nikare gorên şehîdan tehemûl bike. Gelek caran êrîşên goran kir bi balafiran goristanan bombebarankir. Li tu devera cihanê mînaka vî yekê tuneye . Di 11 salên dawiyê de bi hezaran gorên şehîdên HPG'ê hatin talankirin li Îstanbolê li ser goristana bêkesan rêyên asfalt hatin çêkirin lê li hemberê wî hovitiyê bertek nîşan neda. Herî dawiyê bi destpêkirina pêvajoya aşitî û civaka demokratîk re bi erêkirina wezareta hundirîn li Amed Liceyê gorên gerîlayê HPG û YJA-STAR'ê ku xûşk û birane hewildan ku xira bikin bi nerazîbûna ferdên malbatê û mudexeleyan esker hat rawestandin, lê nivîsên ku li ser kêlên wan hatibûn nivîsandin hatin rakirin ev jî rastiya hovitiya dewleta Tirk dide xuyakirin.

### Dewleta Tirk ji veşartina cenazeyan ditirse

Piştî banga aşitî û civaka demokratîk û damezrandina komîsyonê di meclîsa Tirkiyê de hê jî heman kiryar û binpêkirinê dewleta Tirk li ser nirxên gel didomin. Ji aliyekî ve behsa xûşk û biratiya Kurd û Tirkan tê kirin, li aliyê din jî astengî li pêşiya lidarxistina merasîmên Gerîlayên HPG'ê hene, heman demê de li Bakûrê Kurdistanê Malbat ji ber kiryarên dewletê nikarin şîna zarokên xwe daynin. Mînaka herê dawiyê li Şirnexê di merasîma gerîlayê HPG'ê de ji gel bêhtir polîsan goristanê girtibû çembere da ku malbat û xizmên şehîd bi awayekî bêdeng cenaze defin bikin, ji malbatê kesên ku fotoy şehîd rakiribûn hatin binçavkirin. Ev jî rastiya dewleta Tirk radixe ber çavan ku çiqas ji yekbûna gel ditirse, heman demê de tirsa wê ya li hemberê cenazeyan dide nîşandan.



### Di qanûna navnetewî de rêz li hemberê miriyan

Her çiqas pirensîba rêzgirtina ji bo miriyan û gorên wan bi qasî dîroka mirovahiyê kevin be jî, peymana Lahayê ya 1907'an de rêgezek li dijî bêrêzkirina miriyan dihewîne. Peymana Cenevreyê ya 1949'an jî bi berfirehî mijara rêzgirtina miriyan vedibêje. Xala 8'an a Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî, ku di sala 1998an de hatiye pejirandin, rêzgirtina ji bo miriyan di çarçoveya sûcên şer ên li dijî rûmeta mirovan de vedihewîne. Êrîşên li ser miriyan jî wekî sûcên şer têne hesibandin. Lê belê, di Peymana Mafên Mirovan a Ewropayê û Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê de derbarê rêzgirtina li miriyan an mafên miriyan de tu rêzikname tune ne. Ew kiryar li ber çavên cîhanê têne kirin lê tu kes bertek raber nake û li hemberê wan bêdeng dimîne.

### Qedexekirina ziman

Dewleta Tirk bi sala ye li Kurdistanê qedeqeya zimanê Kurdî li ser gelê Kurd ferz dike û heta niha jî ew qedexe didome. Bi dehan kesên ku ji ber bi zimanê Kurdî axivîne di girtîgehan de hatine girtin, ji bo înkarkirina hebûn û nasnameya xwe rastî tundiyên cûrbe cûr hatine. Qedexeya ziman tê wateya înkarkirina hebûn û nasnameyê. Damezrandina komîsyona Xûşk û Biratiya tirk û kurdan re lazime ji bo demokrasi û wekheviya kurd û tirkan û Qebûlkirina maf û daxwazên Kurdan xebat bihatana meşandin. Lê heya niha jî Dayik nikarin bi zimanê xwe di mala xwe de bi zarokên xwe re biaxivin. Heta niha jî mûdexaleyên daxuyaniyên bi zimanî Kurdî dikin. Bi wan nêzîkatiya çiqas baweriya gel bi gav avêtina dewleta Tirk ji bo aşitiyê hebe ger dixwazin aşitî pêk bînin lazime destpêkê zimanê Kurdî bibe zimaneke fermî.

## Ji Peymana 10'ê Adarê şerek derxistin



**Zekî Bedran**

Hikumta Tirk zext û gefên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomîne. Niha Peymana 10'ê Adarê ji devê xwe dernaxin. Dibêjin ku QSD'ê li gorî peymana 10 Adarê tev nagere. Hewl didin ji peymana hatî îmzekirin êrişekî, şerekî derbixin. Tu rexneyên wan ji HTŞ'ê re tune ne. Weke ku hikumeta Şamê tevayî pêwîstiyên peymanê pêk anîne, lê QSD vê nake! Rastî jî berevajiyê vê ne. Rêveberiya Şamê tu mercên peymanê bi cih neanîne.

Divê civak û hêzên demokrasiyê, pêşketinan baş bişopînin û li hemberî van berevajîkirinan hişyar bin. Ji beriya hevdîtina ku Peymana 10'ê Adarê lê hatibû îmzekirin, hevdîtinek din çêbibû. Di hevdîtina yekemîn de Ehmed Şeri û yên li gel gotibûn, bila QSD di asta ferdî de beşdarî artêşê bibe. Yanî yê bixwaze bila çekê dane û here mala xwe, yê bixwaze jî bila beşdarî artêşê bibe. Lê fermandariya QSD'ê diyar kir ku beşdarî vê nêrînê nebûye. Fermandariya QSD'ê got, emê beşdarî artêşê bibin lê em hêzên xwe belav nakin, emê li herêmên xwe bimînin û bi wî awayî beşdarî pergala artêşê bibin. Di hevdîtina yekemîn de her çendî di gelek xalan de gihiştibin heman nêrînan, lê peyman nehat îzmekirin. Di Peymana 10'ê Adarê de Ehmed Şeri qala beşdarbûna QSD'ê ya ferdî nekiribû jî. Berevajî, dê di vê mijarê de komîte bên avakirin, hevkarî, rêbazên entegrasyonê nîqaş bikin û bigîhin encamekî.

Madeyên di Peymana 10'ê Adarê de tên zanîn. Di wir de, dê mafê Kurdan weke yê endamên bingehîn di makezagonê de biketiba mîsogeriyê. Dê li tevayî Sûriyê agirbest bihata çêkirin. Piştî peyman hat îzmekirin, hikumeta veguhêz a HTŞ'ê ava kirî, makezagonek amede kir û îlan kir. Di vê makezagonê de, maf û mîsogeriya mafê Kurdan a di peymanê de qet cih negirt. Ev makezagon bi temamî yekalî û li gorî hişmendiya HTŞ'ê hat amedekirin. Piştî wê hikumeteke veguhêz hat avakirin. Di van biryaran de û di tiştên hatî kirin de, QSD, rêveberiya xweser û hêzên din ên siyasî nehatin hesibandin, hevkariya bi wan re çênebû.

Rêveberiya Xweser û QSD'ê ji destpêkê ve, dema Baasê jî di nav de hertim daxwaza Sûriyeyek demokratîk kir. Ji tecrûbeya Baas'ê jî girte dest, da diyarkirin ku pergalek yekperest û navendî bi rastiya Sûriyê re naguncawe. Heman daxwazên xwe niha jî dubare dikin.

Li gel vê jî, Rêveberiya Xweser weke hêzeke ku dixwaze Sûriyê parçe bike nîşandan, bi temamî propogandayek bi niyeta xirab tê kirin e.

Tirkiye bela xwe ji Sûriyê venake. Divê hêzên Sûriyeyî goftogo bikin û ew bixwe pirsgirêkên xwe çareser bikin. Divê yên li Enqerê biryar nedin ku dê li Sûriyê pergalek çawa bê avakirin. Enqere her roj gefan Ii Rêveberiya Xweser dike, destwerdana karê hindirîn ê Sûriyê dike. Enqere dikare rolek erênî bilîze. Dikare bi aliyan re diyalogê çêbike, wan nêzî hev bike, rol di demokrasî û lihevkirinê de bilîze. Lê tişta tê kirin berevajî ye. Enqere ji HTŞ'ê zêdetir gefê li QSD'ê dixwe. Dibêjin, an hûnê radest bibin, dest ji maf û daxwazên xwe berdin, hêzên xwe yên parastinê belav bikin, an jî emê wir veguherînin kabûsekî.

Armanca Peymana 10'ê Adarê lihevkirin bû, bi hevdû re avakirina Sûriyeyê bû. Niha hewl didin vê armancê berevajî bikin, veguherînin hênceta şer û pevçûnan. Serê vê yekê jî Tirkiye dikişîne. HTŞ ne di hişmendiyek demokratîk, lihevkirin û rêveberiyek hevpar de ye. Weke hişmendî li dijî demokrasiyê ye. Dixwaze rejîmek ji ya Baasê paşketî û otorîtertir, xwe dispêre serîtewandinê ava bike. Ev rastiya HTŞ'ê ye. Lê HŞT di nava hevsengiyên hêzê yên heyî de, nikare bi serê xwe vê bike. Yê ku hêzê dide vê û dixe tevgerê Tirkiye ye. Di vî alî de xirabiya ku Tirkiye dike, tenê bi Kurdan û rêveberiya xweser re sînordar namîne. Xirabiyê li tevayî Sûriyê dike û dixe hindirê tûnêlek tarî.

Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê niha bûye yek ji rojevên bingehîn ên Tirkiyê. AKP, MHP, MGK (Lijneya Ewlehiya Netewî), hertim vê mijarê dikin rojeva civînên xwe, daxuyaniyan didin. Ewqas pirsgirêkên giran ên Tirkiyê hene. Ewqas serê xwe bi wan pirsgirêkan re êşandibana niha tevayî pirsgirêkên Tirkiyê çareser kiribûn. Dijminahiya li dijî Rojava, berdewamiya pirsgirêka Kurd e. Eger pirsgirêka Kurdan çareser bikin, pirsgirêkek wan a bi navê Rojava jî namîne. Dibêjin emê xwişk-biratiya Kurd û Tirkan çêbikin. Eger wisa be, dê Kurdên li Rojava jî bibin xwişk-birayên wan. Eger Tirkiye di vir de cidî be, ma dê xwişk-birayên xwe bi HTŞ'ê bide şikandin?

Ma ne divê Kurd û Tirk vê lêpirsîn bikin? Ma gotinek wan ji kesên di TV yên Tirkan de gurkirina şer dikin, senaryonên karesatan amede dikin re tune ye? Ma dema Kurd bên qirkirin, dê xwişk-biratiya Kurd-Tirkan çêbibe?



## Gefên li ser Rojava

**Farûk Sakik**

Dema ku di 7'ê Cotmeha 2023'yan de moşekên Hamasê ber bi bajarê Israîl-Aşkelon ve bi rê ketin, şerê Rojhilata Navîn derbasî qonaxek nû bû. Bersiva Îsraîl hetanî roja me dewam dike. Hamas, Hîzbûllah û Îran di hedefa wan de bû. Gelek serok û fermandarên Hamas, Hîzbûllah û Îranê yek bi yek hatin kuştin. Di Hezîrana 2025'an de 12 roj şerê Îsraîl û Îranê hebû.

Ji şer zêdetir wek tatbîqatên leşkerî bû. Hemû cîhan di ekranên xwe de fuzeyên ji herdu navendan birêdiketin temaşekirin.

Di 27'ê Mijdarê de tevgerek din dest pê kir. Hêzên HTŞ'ê ji Îdlîb ber bi Şamê seferek da destpêkirin. 12 roj şunde dema hatin Şamê, Beşar Esad Sûriye terk kiribû. Di 8'ê Kanûna 2024'an de HTŞ û Ahmed Şera-Colonî li Şamê desthilatdarbûn. Kê pêşî li van hêzan vekir encama ku di 12 salan de negirtibûn di 12 rojan de girtin. Navê Îsraîl derbas dibû. Dema ku Beşar Esad Şam terk kir, Rûsya jî Sûriye û Rojhilata Navîn terk kir. Êdî hêz û hikimdariya wê li heremê qels bû.

Dema ku ev geşadan li Sûriyê pêk dihatin, li Tirkiyê serdemeke nû ya Bahçelî 2 meh berê dabû destpêkirin, dihat nîqaşkirin. Behsa biratiya Kurd û Tirkan a hezar salî dikirin. Behsa talukeya Îsraîl dikirin. Dema statuya siyasî ya Sûriyê hat guhertin, wan jî serdema nû ya bi Rêber Apo re dane seknandin. Piştî demek dirêj di 27'ê sibatê de Rêber Apo banga 'aştî û civaka demokratîk' kir. Şerê ji sala 1984'an de destpêkiribû bi dawî kirin. Di vî şerî de ne dewlet bi serketibû û nejî Kurd. Rêber Apo digot doza Kurdistan êdî bi siyaseta demokratîk wê were meşandin.

Dema ku ev pêvajo dom dikir, li aliyek jî bi pêşengtiya Hakan Fîdan heyet diçûn Şamê û dihatin. Dixwestin statuya rêveberiya xweser tasviye bikin. Dest bi tehdîdan kirin. Heftiya bûrî Bahçelî jî tevlî vê heyetê bû û wî jî dest bi gefan kir. Dewleta Tirkiyê hetanî roja me nikaribû bersivek bide ka ji Rojava ber bi welatê wan ve talukeyek çawa heye. Berê digot PKK heye û em bi PKK'ê re şer dikin. Piştî ku PKK xwe fesh kir, îroj tiştek dinan anîn rojevê. Dibêjin, Îsraîl statuya rêveberiya xweser li dijî me wê bikarbîne û ji wêderê ewê erişî me bikin.

Ev hewldanên erîşkirina Rojava wek qozekê bikartînin. Ew jî dizanin êdî nehêsane wek berê çawa erişî Afrîn û Serêkaniyê kirin îroj ji nûde biceribînin. Îroj li Sûriye hin hêzên dinan jî hene. Ew jî dizanin van hêzan wê destûr nedin ku Erdogan, carek din Rojavayê Kurdistan dagirbike. Dizanin lê gefxawrin dewamdike. Dixwazin bi tehdîdan bazariyekê bi Rêber Apo re bikin. Bi taybet dixwazin QSD were tasfiyekirin anjî tevlî artêşa Sûrî ya ku 'tuneye' bibe. Rêber Apo dizane ku Rojava bê parastin bimîne wê çi were serê wan û wê herêm bi komkujiyan re rû bi rû bimîne. Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyeyê (SOHR) hin îstatîk parvekir. Ji 8´ê Kanûna 2024'an û heta 6'ê Îlona 2025'an, di nava 9 mehan de 10 hezar û 672 kes ji ber kiryarên tundî û aloziyê hatine kuştin. Ji van kesan 8 hezar û 180 jê sivîl in. Ji hejmara giştî 3 hezar û 20 kes li meydanan hatine înfazkirin. Li Sûriyeyek bi vî rengî, Kurd çawa wê çeka xwe radestê hikumeta şamê ya veguhêz bikin.